

# Hin notên li ser “Şevbihêrkên Şevên Xalî” Îbrahîm seydo aydogan

Serê sala 2002an, çîrokên Enwer Karahanî yên ku berê jî çend heb ji wan di kovaran de hatibûn çapkirin, wek pirtûk di nav Weşanên Dozê re, bi çap û bergeke xweşik ku li nav û naveroka pirtûkê kiribû, derket. Ev pirtûk, berhema nivîskêr ya yekem e.

Di pirtûka ku bi navê “**şevbihêrkên şevên xalî**” hatiye çapkirin de sêzdeh çîrokên ku li gora mijarên xwe di sê bêşan de hatine civandin û li binîya wan, ji bo diyarkirina dema nivîsandinê, sala 2000î an jî sala 2001ê hatiye lêkirin, hene. Ev yek jî diyar dike ku çîroknivîskarîya Enwer Karahanî ne gelekî kevin e û heke mirov digel zanîna vê agahîya ku ji bo gelek kesên din dikare qelsîyekê jî bi xwe re bîne, bala xwe dide çîrokên wî û awayê wî yê nivîsandinê, mirov tavilê tê digihîje ku di pêvajoya van herdu salên dawîyê de serê xwe bi teknîk û formên nivîskarîyê re gelekî êşandiye û di karê xwe de baş bi ser ketiye.

Nivîskêr xwastiye pênc çîrokên xwe yên herî biserketî ku dê ji alîyê xwendevanên xwe ve tavilê bêne hezkirin, têxe serê pirtûkê û wan di beşê yekem de pêşkêşî xwendevanên xwe bike û her weha gava mirov bala xwe baş bide mijar, teknîk û formên çîrokan, mirov baştir fahm dike bê nivîskêr ji bo çîrok bi sê beşan ji hevdu ve qetandine û heq dide wî; lê gava mirov dîsa bala xwe baş bide heman taybetmendîyên wan çîrokan, mirov dibêje qey di nivîskarîya Enwer Karahanî de sê celebên nivîskarîyê ku yek ji yekî cudatir in hene ku ev xisûsiyet jî bi xwe re aloziyekê tîne ku bivê nevê pirseke weha tê bîra mirovî: Nivîskarê ku çîrokên mîna yên beşê yekem çak û biserketî nivîsandibin û baş diyar e ku wî bi xwe jî ew çîrok danînin ser hemû çîrokên xwe yên din û ji lewra mirov fahm dike ku ew jî ji çîrokên weha hez dike, çawa dikare çîrokên beşê sêyem jî ku ji bilî ya serî ku navê wê “Begê Min” e qet naşibin nivîskarîya wî teva yên din çap bike?

Çîrokên beşê yekem ku mirov teknîk, form, mijar û hûnandinên nûjen û nivîskarîyeke xurt û biserketî di wan de dibîne û kêfeke bêpayan ji xwendina wan werdigire, ji bo bipêşketina çîroknivîskarîya kurdî hêvîyeke gelekî xurt û biheq jî bi mirovî re peyda dikin. Nivîskêr di vî beşê de li ser leheng, mijar û teşeyên çîrokên xwe baş konsantre bûye û kêmanî û zêdehiyên ku bi awayekî din mirov dikare bibêje “lazimî û nelazimî” yên hûrgilîyan baş ji hev derxistine û bi xwe vê xisûsiyeta wî jî kiriye ku bi ser bikeve û van çîrokên ku şayanî pîrozkirinê nin biafirîne.

Ji bilî çîroka dawîn ya vî beşê yekem, herçar çîrokên din mijarên xwe ji jiyana kurdên ku li Ewrûpayê dijîn werdigirin û teva çîroka pêncan, bitenêti û trajedîya kesane teva bandora bûyeran ya li ser wan û guherînên wan yên hindurîn û derveyîn bi zimanekî xweş û herikbar rave dikin. Di çîroka serî ku navê wê “Rojbûyin” e de, bi çûyin û hatinên di nava xewnan û rastîyê de, nivîskêr xwastiye bêrikirina welêt û guherînên di jiyana kurdên derveyî welêt de, li derdora mijareke weha ku derzîyan di canê mirovî re radike, bi hûnandin û teşeyeke vegotinê ya nû, teva hêlên lehengan yên însanî ragihîne xwendevanên xwe ku ev awayê nivîsandinê ku di vê çîrokê de hatiye bikaranîn, mirov bi rehetî dikare bibêje ku pêşengîya çîroknivîskarîya wî kiriye û bûye jêderka herçar çîrokên vî beşê yên din. Ji xwe ji dema wan ya nivîsandinê jî baş diyar dibe ku ev çîrok berî yên din hatiye nivîsandin. Ji ber ku di vî beşê de, bi tenê li binîya vê çîrokê “sala 2000î” hatiye lêkirin, li gora ku hatiye eşkerekirin, yên din hemû di sala 2001ê de hatin nivîsandin.

Di “Rojbûyinê” de, lehengê ku navê wî Melûl e, berî ku rabe ser xwe û biçê ji bo pîrozkirina rojbûyina keça xwe Laleşê danûstendinê bike, çavên xwe li xewnekê vedike û jiyana wî ya li welêt tê ber çavên wî; bi dû re jî derbasî kabûsekî dibe û dibîne ku ji alîyê

birazîyê xwe yê ku tev li sofîkan bûye ve tê kuştin û ji alîyê malbata xwe ve tê binaxkirin. Nivîskar berê behs dike bê çawa tê kuştin û tê binaxkirin û bi dû re digel ku karîbû zû bi zû derbas bikiraya jî piştî ku herkes ji ser gora wî belav dibe, berê kameraya xwe dide dêya Melûlî ku ew bi destê xwe xistiye gorê û birayê wî yê ku dixwaze dêya xwe aşt bike û bi awayekî hostetî derbasî rastîyê dibe.

*“... Hew pîredêya wî û birayê wî li ser mezeli mabûn. Birayê wî bi destê dêya xwe girt û ji ser axa sar rakir. Rebena dêya wî cara dawîyê got, “de rabe ha, ka em tevde herin malê, ha!” Lawê wê destê xwe yê rastê di ser hustuyê wê re bir û ew kir ber paxila xwe. Deh gavekî ji mezeli bi dûr ketin... Dêya wî dîsa li mezeli fitilî bi dengê hêla bang kir, “Melûûûlll, ha Melûl! De ka rabe, ha! Qe nebe, carekê dilê min rehet bike, de rabe ha!”*

*Wî çavên xwe vekirin ku jina wî di ser serê wî re sekinîye, wî dihejîne û dibêje, “Melûl, Melûl! Rabe tu dereng mayî!”*

Jina Melûlî li malê xwarinê amade dike, ew jî diçe pastayê bikire û vedigere, lê ji ber ku ji bîr kiriye mûman bikire, keça wî ya ku dê têtetaya heyştalîya xwe, dilê xwe digire û ber bi balqonê ve diçe. Melûlê ku dixwaze ber dilê keça xwe Laleşê xweş bike, diçe û bi wê şad dibe û henekan bi wê dike. Nivîskar dawîya vê bûyerê weha bi awayekî ku ji nişka ve tasek ava cemidî bi ser mirovî de dake diqedîne.

*“... Ew diqidiqand... Heta ku Laleş kenîya. Kenîya, îcar rahişt wê. Berê xwe bi wê ve kir, lê wê destên xwe dabûn ser çavên xwe... wê bi wî awayî delalîyên xwe li bavê xwe dikirin. Melûlî devê xwe kir qirika wî û ew maçî kir... Bû hakehaka wê... Melûlî rahişt wê, ew di ser hesinên balqonê re bilind kir û got, ez te biavêjim jêrê? Bi gotina wî re, Laleşê xwe ji nav destên wî vezîtikand, her ku Melûlî xwast hakimî wê bibe, wê tempo ya perpitandinê zêde kir... Ji nav destên wî fistiqî... Dewa wê ket destê wî. Li hewa cara dawîyê bang kir: Hahooo, bavo! Tîrejek ji kirasê wê di destê Melûlî de ma.”*

Di çîroka dawîn ku navê wê “Qeder” e de, bi heman şewazê û bi heman xurtîyê û dîsa bi hûnandineke biserketî û dîsa bi rêwîtiya di navbera xewnan û rastîyê de, trajedîya jinên ku bêyî dilê xwe mêr dikin di serborîya Herbiyeyê re ku bi zilamekî di umrê bavê xwe de re zewicîye û bûye dêya du zarokan, bi niherîneke nûjen li ber çavên xwendevanan radixe. Serborîyên jinên kurdan yê ku heta dawîya temenê wan neheqî li wan tê kirin, di çîroka bi navê “Dara Bêgul” de, vê carê bi zimanê jinekê ku piştî salan teva zarokên xwe diçe Swêdê, cem mêrê xwe û di kurtedema daketina balafirê de di dilê xwe de bi mêrê xwe re dipeyive hatiye vegotin. Gava ku di nav kesên ku ji bo pêşwazîkirina merivên xwe hatin balafirgehê de li mêrê xwe digere, jinik, dawîya çîroka xwe weha tîne ku mirov dikare guherînen di kesan de û bandora vê yekê û rewşa jinên kurdan (ilhes jî di hevoka dawîn de) bi zelalî bibîne.

*“... De vaye êdî em li ber derîyê dawîyê nin û ez û zarok bi hev re çavên xwe li te digerînin, lê ka tu? Waye çar-pênc kesên rengnas xuya dibin, lê ka tu?..*

*Wî li min rebenê! Ma ev tu yî ku zarokan xwe avêtiye histuyê te? Ma çima li te werê hatiye? Ma ka porê te? Ka diranên te? Ma tu çima weha xûz bûyî? Tew çav jî çûnin... Wî berçavik jî xistiye çavên xwe. Vaye ez sar sekinîmim, lê ez nizamim, bê tu yê min jî himbêz bikî, an na?”*

Di “Şikêlî” de dîsa çîrok ji devê lehengî hatiye vegotin, lê vê carê leheng kurdekî Ewrûpayê ye ku piştî bîst û yek salan li hevalekî xwe yê kevin rast tê û dibîne ku hezkiriya wî ya kevin bûye jina wî hevalê wî. Gava mirov çîroka bi navê “Şeveke Xalî” jî ku dîsa bi çûyin û hatinên di navbera xewnan û rastîyê de hatiye nivîsandin deyne cem herçar çîrokên din,

wêneyekî kurdan yê piçûk pêk tê. Digel hersê çîrokên ku behsa serborîyên kurdên ku ji mecbûrî li derveyî welêt dijîn dikin, mirov dikare bibêje ku “Qeder”a Herbîyeyê û serborîya jina ku di balafirê de xwe bi xwe bi mêrê xwe re dipeyive ya “Dara Bêgul” wek mijar jî baş hatine hilbijartin û hêla nivîskêr ya ku hê ji welêt neqetiyaye û helwêsta wî ya li hember rewşa jinên kurdan ya karesat temsîl dikin.

Di beşê duyem de çar çîrok hene ku sisê ji wan mijarên xwe ji jiyana kurdan ya tevlihev û xembar werdigirin. Di çîroka “Gûzci” de bûyereke ku gelek caran û bi gelek awayên wek yê vê çîrokê hatiye serê gundîyên kurdan, di nava serborîya gundîyekî re ku gûzan dide hev lê gava çav li leşkeran dikeve ji ber ku baş bi tirkî nizane û ji ber wê dest û lingên wê li hev digerin û derfetê nabîne ku derdê xwe bibêje, ji aliyê leşkeran ve weke yekî ku çavdêriya gerîllayan dike tê girtin û ji lewra pênc salan di girtîgehê de dimîne, bi zimanekî xweş hatiye vegotin. Çîroka “Kul” ku serborîya Seydoşê mamoste yê ku ji ber ku bi siyasetê ve mijûl dibe û cihê gerîllayan li xwe mikur nayê ji polîsan lêxistinê dixwe û ji ber ku hevaltîya gerîllayan nake jî mohra “ajantî”yê (!) dixwe, mecbûr dimîne ku derkeve derveyî welêt û li wira ji aliyê gerîllayên ku daye ser şopa wî ve tê kuştin jî rengê din yê jiyana kurdan ya dawîya sedsala bîstî nîşan dide. Mijara çîroka bi navê “Jan” ku behsa malbateke kurd ku lawekî wan şoreşger e û lawekî din jî tev li sofikan bûye û şoreşgerên kurdan dikuje dibe, ku bav mecbûr dimîne ku lawê xwe yê sofik bikuje û dikeve girtîgehê, lê bi dû re ji aliyê keça xwe ve ji ber ku birayê wê kuştîye tê kuştin. Ev herdu mijarên “Jan”ê û “Kul”ê ku mîna ku bi bêsebirîyê û zû bi zû hatibin nivîsandin dixuyên, ji bo forma çîrokekê gelekî giran û tevlihev û belawela nin ku divîya mirov li ser wan hebekî din jî hûr bibûya. Di vî beşê duyem de bi tenê çîroka Xeloyê ku gorima xweha xwe direvîne û ji ber vê kirina wî birayê wî tê kuştin ku navê wê “Bêbextî” ye, bi mijara xwe ji çîrokên din ve diqete.

Di beşê sêyem de ji bilî “Begê Min” ku bi mijara xwe ve nêzîkîyê li beşê duyem dike, hersê çîrokên din, heke mirov rastîyê bibêje, mîna ku ji aliyê nivîskarê çîrokên herdu beşên serî nehatibin nivîsandin dixuyên. Awayê vegotinê, teknîk û formên çîroknivîsîyê ku di beşê yekem de hostetîya nivîskêr dida der, di van çîrokan de bi temamî hatine guhertin û qels bûne. Hilbijartina mijarên ku qet naşibin yên herdu beşên serî, bi serê xwe wek guherîn û cudayetîyeke mezin derdikeve pêşberî mirovî; lê belê, ji ber ku berhema yekem e, mirov dikare van guhertinên di çîroknivîskarîya nivîskêr de xuya dibin fahm bike.

Di çîrokan de ji bo zimanê gelêrî jî, ji devokê Dêrikê nimûneyên baş hene ku kêfa mirov bêhtir ji xwendina wan re tîne.

Bi kurtî, di berhemên bi dû vêya de hêvî ji Enwer Karahan ew e ku di nivîskarîya xwe de ji hersê şexsîyetên xwe yên nivîskarîyê, tim û daîm, şexsîyeta nivîskarê ku beşê yekem nivîsîye bi pêş derxîne.

[ibrahimseydo@hotmail.com](mailto:ibrahimseydo@hotmail.com)